Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 389 nameronahi@gmail.com 04 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Avrîn çîroka berxwedanê vedibêje





Idrîs HENAN

Nexweşxaneya Avrîn yek ji saziyên herî zêde şahîdiya hovîtiya dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê kiriye. Ji yekemîn roja êrîşan ve rasterast bû armanca balefirên faşîzma Tirk. Ekîpa Avrîn dizanîbû ku dewleta Tirk ti zagon û exlaqekî şer nasnake, ji ber vê jî di 15 Adara 2018an de û bi bilindbûna asta hovîtiyê re, hinek alav û amûrên nexweşxaneyê veguhestin navçeya Şerawa. Li wir jî nexweşxaneya Avrîn xizmeta tendirustiyê bi îmkanên heyî dewam kir.

### AVRÎN HEWCEYÎ DOKTORÊN PISPOR E

Li Kantona Şehba li kêleka gelê Ereb, Tirkmen û Kurd bi hezaran Efrîniyên mecbûrî koçberiyê bûne dijîn. Ekîpa Avrîn a ji dehan nexweşnêr û heft bijîşkan pêk tê li navçeya Fafînê bi cih bûye. Di saheya avahiya nexweşxaneya Avrîn de çend Kervanên senkirin, mudexeleya lezgîn, wênegiriya pertewî û labratwarek hene. Lê dîsa jî Avrîn bi hewceyî doktorên pispor ên hemû beşan e.

### XIZMET BÊ PERE YE

Nexweşxaneya Avrîn li kêleka xalên Heyva Sor a Kurd xizmetên tendirustiyê bê pere pêşkêş dike. Tevî kêmderfetiyan û nebûna gelek cureyên derman û doktorên pispor, rojane ji 300 heyanî 500 nexweşan pêşwazî dike. Ev jî ne li gorî kapasîteya alav, amûr û ekîpa Avrîn e.

### EM LI KÊLEKA GELÊ XWE NE

Rêveberê nexweşxaneya Avrîn Dr. Abdulqadir Ico di vê derbarê de dibêje ku ew bi hinek doktorên ji Efrînê koçî hin deverên dîtir kirine re di nava têkîliyê de ne ku vegerin û xizmeta civaka xwe bikin. Derbarê doktorên li Şehbayê jî mane Ico dibêje: Erkekî exlaqî, mirovî û neteweyî li ser pişta van doktoran e. Ji ber vê jî li kêleka gelê xwe li vê herêma paşguhkirî mane.

### BEŞ ZÊDE DIBIN

Nexweşxaneya Avrîn piştî Kîmar û Ehrezê li navçeya Fafînê bi cih dibe. Di rûpîvna xwe ya biçûk de beşên mudexeleya lezgîn a hundirîn, zarok, mudexeleya emeliyatê, labratwar, wênegiriya pertewî û dermangehek hene. Her wiha sê doktorên hestî, du yên hinavan, bijîşka jinan, bijîşkekî zarokan û 35 nexweşnêr û hinervan hene.

### EM Ê EKÎPA XWE XORT BIKIN

Rêveberê Avrîn Dr. Ico tekez dike ku nexweşxane ji sedî 70 pêdivî û xizmeta tendirustiyê li vê herêmê pêk tîne. Lê dîsa kêmbûna derman û destekdayîna şermok cihê rexnê ye. Niha jî ew hewl didin bi desteka Cizîr, Kobanê û doktorên ji derveyî Şehbayê ekîpa xwe ya tendirustiyê xort bikin.

### JI GEZA MAR Û DÛPIŞKAN RE DERMAN

Dr. Abdulqadir Ico dawiyê de got: Vê dawiyê gelek nexweşiyên nola rûvîkulî, wêran û leşmanyayê belav bûne. Çav li rêye bi alîkariya bi Heyva Sor a Kurd re dermanên pêwîst bên dabînkirin. Her wiha ji bo geza mar û dupişkan wê Heyva Sor a Kurd dermanên pêwîst dabîn bike.

# Minbic.. serdema tarî û serînetewandina ji DAIŞ'ê re –3

***Herêma Minbic ji sala 2014'an heta 2016'an serdemeke tarî jiya. Bajarê ku wekî navenda çandê dihat pênasekirin veguherî bargeha sereke ya çeteyên biyanî yên ku di sînorê Tirkiyê re derbasî Sûriyê dibûn, her qadeke wê bibû cihên serjêkirina mirovan.***

Bi destpêka pêvajoya Şoreşa Sûriyê re gelê Minbicê li hemberî desthilatdariya rêjîma serî rakir. Xwepêşandana yekemîn di 21'ê Nîsana 2011'an dest pê kir.
Girûpên bi navê "Tabûra Kerama, Mucahidî El-Kerama, El-Nûman, El-Qaqa, El-Udeyat, Umer Bin El-Xetab, Siwar Minbic, Şuheda Minbic, Elî Bin Ebî Talib, El-Şêx Eqîl, El-Heremeyn, Um El-Ewasim, Cund Mihemed, Sultan Silêman Şah, El-Buxarî, Seyf El-Islam, Ehrar Sûriya, El-Emniya, Mucahidî Minbic, Fecir El-Islam, Rîmah El-Rafîdeyn, Ceyş El-Islam, Ehrar El-Şam, Ensar El-Suna, Siqûr El-Şam, Ehrar Minbic, El-Farûq, Îbad El-Rihman, El-Qiwa 17, El-Heris El-Sewrî, Ayşa, El-Nesir, Fursan El-Furat, Ebû Eyûb El-Ensarî, Tariq Bin Ziyad, Ecyal El-Musteqbel, Ebû Abdullah Eê-Begarî, El-Ûme, Sefa û Merwa, Tabûra El-Salihîn, El-Şêx Salih, Emar Bin Yasir, Eshab El-Yemîn, El-Herîrî û Heyet El-Emir Bilmarûf û Nehî En El-Munker" di 19'ê Tîrmeha 2012'an de bajar ji destê rêjîmê derxist û deverên herêmê li xwe par kirin, di navbera wan de şer hebû. Çeteyên DAIŞ di Adara 2013'an de êrîşî bajêr kir û di Çileya 2014'an de bajêr bi temamî dagir kirin.

### BAJARÊ ÇANDÊ VEGUHERÎ ZINDANEKE TARÎ

Bajarê Minbicê ji ber cihê xwe yê li rex ava Firatê û nêzî sînorê Bakurê Kurdistanê ye xwedî cihek stratejîk e. Girîngiya xwe ji bo Çeteyê DAIŞ riya stratîjîk e ku bajar bi bargeha sereke ya DAIŞ "Reqa" ve girê dide. Tirkiyê sînorê xwe ji DAIŞ'ê re vedike û derbaskirina alîkariyan lojîstî û leşkerî hesan kir. Her wiha bajar wekî bargeha pêşwazîkirina çeteyên biyanî û perwerdekirina wan dihat dîtin.

### BARGEHA SERKE YA ÇETEYÊN BIYANÎ YE

Herêma Minbic ji bo DAIŞ'ê bargeha duyemîn a piştî Reqa ye û ya yekemîn ji bo çeteyên biyanî dihatin naskirin. Dewleta Tirkiyê sînorê xwe ji çeteyên biyanî re vekir da ku derbasî Sûriyê bibin. Bi dehan belge ku rastiya vê yekê eşkere dikirin derketin holê. Rojnameya Newyork Tims belgeyek weşand, di belgeyê de diyar dibe ku Tirkiyê "Semada Yora" ya ji bo çêkirina teqmenî û bombeyan derbasî Girê Spî kir, her wiha gelek belgeyên din têkiyên bazirganî di navbera DAIŞ û Tirkiyê û Tirkiyê û çeteyên Ehrar El-Şam de hatin dîtin.



### KIRYARÊN DAIŞ LI MINBICÊ

Piştî 6 mehan ji dagirkirinê re, çeteyên DAIŞ dest bi hemleyên girtina li ser malan kirin, çek alavên teknînkê, telefon desteser kirin û kesên çixare bi kar di anîn jî digirtin.
Di Çileya 2014'an de çeteyên DAIŞ herêma Minbicê wekî wîlayetek ragihand û rêbazên xwe yên tumduraw li dijî sivîlan bi kar di anîn. Li deriyê ketina bajaroka Tetalik afîşeyek "Wîlayeta Minbic" danî bû û dîwar bi rengê reş boyax kiribûn.
Hemû dikanên firotina tûtinê û çixare hatin girtin. Kesên çixare bi kar di anîn dihatin digirtin û êşkencekirin. Cilên reş û girtina rû li ser jinan feriz dikirin, qedexe bû ku jin bi tenê li kolanan bimeşe an jî li pey motosêklêtan siwar bibin. Dema çeteyên DAIŞ banga "sînorekê ji dizî, tecawizî, esyancî" re deyn şêniyên Minbic saw digirtin.
Çeteyên DAIŞ bi tawanên cuda, kesê tewanbarkirî li ser dikeke li qada bajar û li pêşberî her kes ceza dikirin da ku ji her kesî re "bibe îbret".

### MIZGEFT RÛXANDIN Û ÎMAM KUŞTIN

Çeteyên DAIŞ, di Gulana 2014'an de bi bahaniya ku gora şêx di mizgeftê de ye, Mizgefta Şêx Eqîl El-Minbicî teqandin. Avakirina goran li mizgeftan qedexe kiribûn. Îmam û xetîbên xwe li mizgeftan belav kirin.
Îmamê Mizgefta Mezin a Mihemed Seyîd El-Dîbo ku rêbazên DAIŞ rexne dikir û qebûl nekir mizgeftê radestî wan bike hate girtin. Şêniyên Minbicê li dijî girtin îmamî mizgeftê çalakî lidar xistin. Çeteyan ji tirsa ku xwepêşandin li herdeverê belav bibe şêx berdan, piştî hefteyekê ew di mizgeftê de li ser nimêja sibeha kuştin.
Hemû dibistan û zanîngeha Ibn Xeldûn girtin û xwendekar ji xwendinê qût kirin. Her wiha mamosteyên wê neçar kirin perwerdeyên olî bibînin da ku li dibistanan bidin.
Hejmara xwendekaran ji sedî 5 derbas nekira îmamê mizgeftê çalakî li dar xistin, çeteyan ew berdan, piştî hefteyekê li mizgeftê kuştin.
Qadên bajar veguherandibûn cihê serjêkirinê, tenê li çerxeriya Sefîne 260 kes hatin serêjkirin. Çeteyên li ser navê "Husba" şênî kontorl dikirin, telefonên wan ên destan, milkên welatiyên ku ji derve bin talan dikirinê. Mûçe li dukandaran û baziranan feriz kirin.
Li hemberî kurdan jî siyasetên "paqijiya etnîkî" meşandin. Dikan û milkên wan telan kirin û bi dehan jî girtin, bi hezaran jî ji qewitandin derve. Bajar kirin bargeha bikaranîna êrîşên yên li ser Kobanê.

### GEL SERÎ NETEWAND

Îradeya gel a li hemberî hovîtiya çeteyan û piştevanên wan neşikest û serî netewand. Gelê Minbicê 18'ê Gulana 2014'ê çalakiyên giravê li dar xistin, çeteyan bi sedan çalakger girtin û gelek jî enfaz kirin. Dîsa jî gel têkoşîna qet ranewestandin û bajarê rizgar kirin. Şêniyên ku ji ber zulma çeteyan neçarî derketinê bibûn hêzên xwe yên parastinê ava kirin. Komên wekî Cebhet El-Ekrad, Şems El Şemal ku piştre di bin sîwaneya Burkan El-Firat de bûn yek, çend ji wana ne. Herî dawiyê di 2'ê Nîsana 2016'ê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê hat avakirin û di 1'ê Hezîrana 2016'an de hemleya rizgarkirina herêmê hat destpêkirin.*ANHA*

# Banga helwestê li hikûmeta Başûr kirin



Rojnamegerên Başûrê Kurdistanê ketina leşkerên Tirk ên nava Başûrê Kurdistanê weke dagirkerî binav kirin û gotin; "Divê Hikûmeta Iraq û Herêma Kurdistanê erkê xwe pêkbînin."*R-5*



# NPG'ê gerîlayên li Xakurkê pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel NPG'ê bi peyamekê gerîlayên li herêma Xakurkê ji ber çalakiyên xwe yên li dijî artêşa Tirk a dagirker pîroz kir. NPG'ê got, "Çalakiya ku hêzên we yên eyaletê li Neqeba Elî Dirêj li dijî hêzên dagirker ên Tirk roja 31'ê Gualna 2018'an kirin, ji aliyê wêrekî û taktîkê ve çalakiyeke serketî bû. Em we silav dikin û di têkoşîna şoreşgerî ya pîroz de hêvîdar in ku hûn ê timî serketî bin."*R-2*

# Teqez bû ku AKP wê têk biçe



Ji bo hilbijartinên li Tirkiyê û bakurê kurdistanê tenê çend hefte mane. Namzetê HDP'ê Selahatîn Demîrtaş ku di girtîgehê de rehîn tê girtin bi hemû hêzêa ji hundur zîndanê hemleya xwe ya ji bio serokomariyê dike. Vê carê jî Demirtaş li ser medyaya sosyal derbarê rojevê hin peyam dan.*R-4*


Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 389 04 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Rûsya dixwaze Îranê ji Sûriyê derxe



*Ezîz KOYLUOGLU* *R-4*

# RÊYA RIZGARIYÊ FELSEFEYA OCALAN E



## 'TECRÎD HERÎ ZÊDE ZiYAN DiDE TiRKiYÊ'

Siyasetmedar û rewşenbîrên navçeya Tirbespiyê diyar kirin ku hikûmeta AKP'ê hewl dide gelên herêmê ji fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dûr bixîne û di vê derbarê de tecrîdeke hişk li ser Ocalan ferz dike.

## TECRÎD LEWAZKiRiNA NETEWA DEMOKRATÎK E

Nivîskarê Kurd Mihemed Emîn Pencewînî jî diyar kir ku dewleta Tirk bi mebesta ku fikirê Netewa Demokrarîk û tevgera rizgariya gelê Kurd lewaz bike di kesayata Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de tecrîdek girankirî feriz kiriye. *R-4*

# Kartal: em dikarin faşîzma AKP-MHP'ê têk bibin



Serokê KONGR-GEL Remzî Kartal li bajarê Orebroyê yê Swêdê axivî û bal kişande ser êrîşên qirker ên ser siyaseta Kurd. Kartal got, Hevserokê HDP'ê Selahattîn Demîrtaş, hin parlamanter girtî ne û li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran heye. Kartal got, hilbijartina ku di nav van şertan de pêk tê ji bo Kurdan û bindestan çendî girîng e. *R-4*

# Jinên Şengalê bi gelê Efrînê re ne



Di çarçoveya Pêngava "Jinên cîhanê ji bo Efrînê serî hildin" de ya ku ji aliyê Rêxistina Kongreya Star ve bi armanca destekdayîna bi gelê Efrînê re hatiye birêxistinkirin li ser navê Jinên Êzidî Hevseroka Desteya Rêveber a Xweseriya Şengalê Zehra Silêman, Rêveberiya Tevgera Azadiya Jinê (TJAÊ) Zehrî Şemp hatin Rojava.*R-3*

# Piştî provakasyonê kampa nû ya kurdan



Hevdîtinên bi pêşengtiya Navenda Çanda Kurdistan (NÇK)-Yewnanîstan encam girt. Rêxistinên civaka sivîl yên Kurd ên li welat piştî provakasyonê daxwaz kirin ku koçberên Kurd bibin kampek din. Piştî qebûlkirina vê daxwazê koçber birin kampeke din. *R-2*

# Minbiciyan Hestên xwe parvekirin




Welatiyên bajarê Minbicê di pêşbîniyeke xêr û hêviyan de bûn, dema ku Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di 1'ê Hizêrana 2016'an de destpêkirina hemleya rizgarkirina herêma Minbicê ragihand. Welatiyan ji ber tirsa ji hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê hestên xwe veşartin.*R-2*

# Jiyanek tijî têkoşîn



Merala biçûk ya di darbeya 12'ê îlonê de ku di 12 saliya xwe de hat girtin û xistin girtîgeha Amedê niha ji Rihayê namzeda HDP'ê ye. Meral Balter ya li Kurdistanê li dijî zîhniyeta mêr têkoşîn da û di berxwedana Geziyê de jî cih girt, jiyana xwe bi têkoşînê derbas kiriye. *R-3*


# Bîlançoya binpêkirinên Gulanê li Efrînê



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê di meha Gulanê li Efrînê zêdeyî 3 hezar û 295 sivîl revendina û 30 jin di nav de yên ducanî jî hebû, hatin revandin û tecawîz kirin. *R-5*


# Rûspiyên Ereb: Erdogan bi çeteyên xwe gelan berdide hev

Rûspiyên êlên Ereb ên Til Hemîsê êrîşa çeteyên dewlet Tirk a li dijî welatiyên ji Êla Bobena li Efrînê şermezar kirin û gotin ku Erdogan dixwaze şerekî navxweyî di navbera pêkhateyên herêmê de derxîne. *R-5*



# Efrînî li Şehba projeyên aborî pêş dixin





Şêniyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dewleta tirk neçarî derketina ber bi Şehbayê çûn jiyana xwe û projeyên xwe yên aborî bi pêş dixin û berxwedana xwe berdewam dikin. *R-6*

# Li Kurdistanê 60 buyerên girîng



Rojnamevan Farûk Sakik bûyerên girîng ên 60 salî ku mohra xwe li Kurdistanê dane bi navê ''60 Bûyer'' kire pirtûk. Sakik got bi mebesta ku bûyerên dîrokê ji nifşên siberojê re bihêle ev pirtûk nivisiye. *R-7*

# Minbiciyan Hestên xwe parvekirin

***Welatiyên bajarê Minbicê di pêşbîniyeke xêr û hêviyan de bûn, dema ku Fermandariya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di 1'ê Hizêrana 2016'an de destpêkirina hemleya rizgarkirina herêma Minbicê ragihand. Welatiyan ji ber tirsa ji hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê hestên xwe veşartin.***



Bi hatina duyemîn salvegera destpêkirina hemleya "Şehîd Feysel Ebû Leyla" ya rizgarkirina bajar û gundewarê Minbicê di 1'ê Hizêran de aramî û ewlehî li herêmê zêde bûye ku bi pêkanîna armanc û daxwazên hemleyê re pêk hatiye û Minbic ji bin destên hovên DAIŞ'ê hate rizgarkirin.

Welatiyên Minbicê di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de jiyaneke trajedîk jiyan kirin û bi hêvî li benda rizgarkirina ji destên çeteyan diman.

### HESETEK BÊ HEMPA BÛ

Welatiyê bi navê Muhdî Debiş got ku dema wan nûçeya destpêkirina hemleya rizgarkirina Minbicê li ser ekrenên telefizyonan bihîstin, hesteke bê hempa jiyan kirin û diyar kir ku bi wê ragihandinê re hêviya welatiyan a xilasbûna ji çeteyên DAIŞ'ê mezin kir, lê dîsa jî ji ber tirsa ji hovîtiya çeteyan welatiyan hestên xwe veşartin.

Muhdî Debiş got ku wî bîstikên rizgariyê û dorpêça di taxa El-Serib de ku 73 rojan dom kir, jiyan kiriye û got ku çeteyên DAIŞ'ê ew weke mertalên zindî bikar dianîn. Debiş da zanîn ku hêviya rizgariyê li ba welatiyan rojane mezintir dibû, nemaze hêzên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê rojane ber bi bajêr ve dihatin.

### EM JI JIYANA TARÎ RİZGAR BÛN

Welatiyê bi navê Mihemed Hemdo Xelef ku ji welatiyên bajarê Minbicê ye behsa hestên xwe yên di dema destpêkirina hemleya Şehîd Feysel Ebû Leyla kir û wiha got: "Me ala azadiyê dît ku ji me ve nêzîk dibe û tarîtiya çeteyên DAIŞ'ê ku me sê salan jiyan dikir ber bi tunebûnê ve diçû. Welatiyên Minbicê ji ber hovîtiya çeteyên DAIŞ'ê jiyaneke tarî derbas kirin û niha jî





di nava aramî û ewlehiyê de jiyan dikin. Destpêkirina hemleya rizgarkirinê ji bo me xaleke dîrokî bû." ***ANHA***

## Piştî provakasyonê kampa nû ya kurdan



Li girava Mîdîlî ya Yewnanîstanê rojên derbasbûyî de ji bo şerê "Kurd-Ereb" provakasyoneke ya MÎT'ê hatibû kirin. Piştî provakasyonê ji bo koçberên Kurd kampeke nû hate avakirin.

Hevdîtinên bi pêşengtiya Navenda Çanda Kurdistan (NÇK)-Yewnanîstan encam girt.

Rêxistinên civaka sivîl yên Kurd ên li welat piştî provakasyonê daxwaz kirin ku koçberên Kurd bibin kampek din. Piştî qebûlkirina vê daxwazê koçber birin kampeke din.

Heyetek li ser navê NÇK-Yewnanîstanê, ku endama TJK-E û siyasetmedara Kurd Rûken Demîr, nûnerê PYD'ê yê Yewnanîstan Îbrahîm Muslim, Hevserokê Meclîsa Civaka Demokratîk a Yewnanîstanê Bahdîn Ahmed û Wezîrê Koçberan yê Yewnanîstanê di nav de girse pêşwazî kirin.

Li ser navê heyetê Rûken Demîr axivî û spasiya berpirsên Yewnan kir ku di demek nêz de kampek nû dane koçberên Kurd.

Demîr qala yekîtiya Kurd-Ereb ya di îtîfaqa QSD'ê ya li Sûriyeyê de jî kir û got ruhê QSD'ê di van bûyerên wiha de dixwazin yekîtiya gelê Kurd-Ereb provake bikin û îstîxbareta Tirk vî karî dike.

Dayikeke ji Efrînê ku li Kampa Mîdîlliyê dima li ser navê gel axivî û wiha got; "Di nava kêsên êrîş kirin de kesên ku berê li kampê diman tune bû. Êrîş bi plan hate kirin û maske li ber rûyê hinek êrîşkaran bû"

Dayika ji Efrînê got, ti pirsgirêka wan bi gelê Ereb re nîne û di demên dawî de kesên biyanî dihatin kampê û xwestin bûyeran provake bikin. Dayika ji bo xwedîderketina PYD a li gel spasî kir û wiha got; "Em bi partiya xwe serbilind in. Bijî Serok Apo."

## NPG'ê gerîlayên li Xakurkê pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) gerîlayên li herêma Xakurkê ji ber çalakiyên xwe yên li dijî artêşa Tirk a dagirker pîroz kir.

Peyama Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) li malpera HPG'ê hate weşandin. Peyam wiha ye:

"Çalakiya ku hêzên we yên eyaletê li Neqeba Elî Dirêj li dijî hêzên dagirker ên Tirk roja 31'ê Gualna 2018'an kirin, ji aliyê wêrekî û taktîkê ve çalakiyeke serketî bû. Vê çalakiyê careke din nîşan da; eger hunera xurt a manewrayê û taktîkên dewlemend ên gerîla bi şêweyekî afirîner bên bikaranîn, pêkane ku hêz û teknîka dewleta faşîst-mêtinger bê qelskirin û bêyî dayina windahiyan, derbên kujer û giran li hêzên dijmin bên xistin.

Di vê çarçoveyê de bi rêbaza



çalakiyê û ruhê serdemê li Neqeba Elî Dirêj a Lêlîkanê hêzên we hedefa xwe îmha kirin, bi ser dijmin ve çûn û çek û alavên leşkerî ji ser wan rakirin. Bi navê rêveberiya tevgera me, em hemû hevrêyên fermandar û şervanên tevlî vê çalakiyê bûn pîroz dikin û hêvîdar in ku wê timî serketî bin.

Hemû hevalên çalakger, we û hemû hêzên li eyaletê bi hezkirin û rêzdarî silav dikin. Di têkoşîna şoreşgerî ya pîroz de hêvîdar in ku hûn ê timî serketî bin."



## Li Îraqê banga boykota Tirkiyê

Çalakvan û xebatkarên ragîhandinê yên Îraqê kiriyarên Tirkiyê û Îranê ên derbarê Îraqê û qutkirina ava çemê Dicle şermezar kirin û bang destwerdana lezgîn beranberî qutkirina ava Diclê kirin. Di heman demê de banga boykotkirina tiştên li Tirkiyê hatine çêkirin, kirin.

Li gorî nûçeya Someriya News, asta Çemê Diclê li Bexda û Mûslê pir kêm bûye û gihiştiye asteke kêm ku tu carî neketiyê. Hate gotin ku êdî mirov bi meşê dikarin ava çem derbas bikin. Ev yek piştî ku dewleta Tirk ragîhand ku wan dest bi dagtina Bendava Ilisu ku dewlet Tirk li ser kaniya Çemê Dicle saz kiriye, pêk hatiye. Vê yekê derhal bandor li ser xaka Îraqê kiriye û asta avê pir kêm bû ye.

Di heman demê de jî dewleta Îranê ava Çemê Zaba Biçûk ji ser parêzgeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê qut kiriye. Di encamê de aloziya pirojeya avê li Qeledizê pêk hatiye.

Ji ber vê yekê di nava civaka Îraqê de nerazîbûn pêk hatiye. Çalakvan û rojnamavanên Îraqê li ser malperên xwe yên civakî li dijî kiryarên dewleta Tirk û Îranê yên qutkirina avê li ser cîrana wan Îraqê nerazîbûn nîşan dan. Her wiha bang hate kirin ku di zûtirîn dem de destwerdan were kirin da ku rê li ber karîseta mirovî were girtin.

Hinan jî helwesta Hikûmeta Îraqê ya derbarê aloziyê rexen kirin û xwestin ku hikûmeta Îraqê li dijî avakirina bendan ku dewleta Tirk ev çend sal in pêk tîn e, nerazîbûna xwe nîşan bide û tedbîrên pêwîst pêk bîn e. Hin çalakvanan jî hemleya boykotkirina tiştên Tirkiyê û Îranê ragîhandin.

## Tecrîd lewazkirina Netewa Demokratîk e



***Nivîskarê Kurd Mihemed Emîn Pencewînî diyar kir ku dewleta bi mebesta ku fikirê Netewa Demokrarîk û tevgera rizgariya gelê Kurd lewaz bike di kesayata Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de tecrîdek girankirî feriz kiriye.***

Nivîskarê Kurd ê ji Başûrê Kurdistanê Mihemed Emîn Pencewînî di hevdîtineke xwe de li gel ajansa me diyar kir ku dewleta Tirk di kesayeta "Rêberê Netewî xwediyê fikirê demokratîk Abdullah Ocalan " de tolê hiltîne.

Pencewînî, bal kişand li ser dijminahiya dîrokî ya dewleta Tirk ya ji bo gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê û wiha got, "Dewleta Tirk a şofonist, dît ku Ocalan xwediyê tewreya çareserkirina aloziya herêmê ye, hemî gel bi fikirê wî bawer in. Ji ber vê yekê tecrîdeke giran li ser wî feriz kirine."

Mihemed Emîn Pencewînî daxuya kirin ku dijmin di aliyê siyasî, edeolojî û çekdarî şerê gel gelê Kurd dike, herî dawî xwest bi riya tecrîda li ser Ocalan kurdan neçar bike ku ji daxwazên mafên xwe dakevin. Pencewînî anî ziman ku divê gelê Kurd radeya xeteriya vê merheleyê nas bike.

Nivîskarê Kurd Mihemed Emîn Pencewînî, di dawiya axaftina xwe de, daxwaz ji hiqûqa mafê mirovan û saziyên navdewletî ku erka xwe ya mirovî ya derbarê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk bîne. Her wiha bang li Kurdên li Ewrupayê kir ku çalakiyên xwe berdewam bikin û fişarê li Yekîtiya Ewropa bikin da ku Tirkiyê destur bide malbat û parêzeran ku Ocalan bibînin. ***ROJNEWS***





# Li Kurdistanê 60 buyerên girîng

***Rojnamevan Farûk Sakik bûyerên girîng ên 60 salî ku mohra xwe li Kurdistanê dane bi navê ''60 Bûyer'' kire pirtûk. Sakik got bi mebesta ku bûyerên dîrokê ji nifşên siberojê re bihêle ev pirtûk nivisiye.***



Rojnamevan Farûk Sakik ku ev nêzî 30 sal in li Kurdistanê û Ewropayê nûçegihaniyê dike 60 bûyerên girîng ên vî 60 salê dawî ku mohra xwe li Kurdistanê daye bi navê ''Ewroj /Ji Dîroka Nêz 60 bûyer'' kire pirtûk. Pirtûka ku bi Kurdî hatî amadekirin beriya bi çend rojan ji Weşanên Mezopotamyayê derket.

Pirtûk doza xwendekarên Kurd ku bi rengê ''Doza 49'an'' tê zanîn, 1978'an avabûna PKK'ê, destpêka şerê çekdarî yê Kurdan ên li dijî dewleta Tirk a 15'ê Tebaxê, Komkujiya Halepçe, avabûna MED TV, Komkujiya Roboskê û herî dawî berxwedana xwerêveberiyê ya 2015'an a Bakur di nav xwe de vedihewîne.

Pirtûk xwe dispêrê wêne û belgeyan û îfadeyên şahidên demê. Nivîskar li ser pirtûkê got, ''Teqez divê li mala her Kurdî hebe''.

Sakik got ji pirtûkê armanca wî ew e ku bûyerên 60 salên dawî ji nifşê nû re bihêle.

Sakik dibêje ku wî ev pirtûka navborî beriya niha di Roj Tv û Stêrk TVde di bernameya 'Arşîv'ê de weşandiye, bûyerên girîng yên dîroka nêz in û ev dîrok diviya mayinde bibûya, ji bo vê sedemê jî pirtûk amade kiriye.

Sakik li ser armanca xwe ya amadekirina pirtûkê jî wiha dibêje; ''Ji bo ku em ji zarokên xwe re û siberoja xwe re bihêlin min ev pirtûk hazir kir. Ji bo ku 60 bûyerên 60 salên dawî ji veguhezînim nifşê nû. Ji 1950'î heta 2015'an dI van hemû bûyeran de êş hene. Ji bo ku ev neyê jibîrkirin, dubare nebe û were zanîn min ev nivîsî.''

Nivîskarê pirtûkê diyar dike ku pirtûk li ser sê bingehan ava bûye; doza 49'an, avabûna PKK'ê ya di 1978'an de û serdema xwerêveberiyê ya 2015'an.

Sedama vê jî wiha dibêje, ''Çima doza 48'an? Piştî serhildanan demeke dirêj bêdengiyek çêbû, 49 dixwazin vê bişkînin lê dewlet bi ser wan de diçe. Têkoşîna ku xwendekarên Kurd dixwazin bidin destpêkirin tê tepisandin. Dîsa bêdengî. Piştre nifşê 68'an û tevgerên xwendekaran, 1978'an ji nav tevgerên xwendekaran Apocî PKK'ê ava dikin.

PKK pêvajoyek e. Armanca PKK'ê xweseriya demokratîk bû. 2015'an bi ragihandina xweseriya demokratîk ev armanc hate danîn. 49 bi ser neketin. 78'an rêxistinek ava bû, 2015'an gihaşte armanca xwe.''

Di pirtûkê de mijarên ku dertên pêş; avabûna PKK'ê, 15'ê Tebaxê, kuştina Esad Oktay Yildiran, kuştina Cengîz Altûn, 1994'an avêtina parlamenterên DEP'ê û girtina wan, komkujiya Helepçe, Newala Qesaba, kuştina Vedat Aydin, avabûna MED TV, komkujiya Sêwasê û Şoreşa Rojava.

Sakik derbarê pirtûkê de dibêje, ''Ev pirtûk bi wesfê lêkolîn, belgeyê ye. Bîr, dîrok û bibîranîn e. Divê li mala her Kurdî hebe. Tekana armanca min ew e ku nifşên nû vê zanibin. ''

Nivîskarê pirtûkê diyar dike ku wî bixwe şahidî ji hin van bûyeran re kiriye. Yên din jî bi nûçegihaniyê şopandiye. Şahidî şewitandina gundên Mûşê kiriye, tevlî merasîma cenazeyê Vedat Aydin bûye, şahidê destpêka rojnameya Serxwebûnê bûye. Her wiha bûye şahid ku DEP'î ji meclîsê hatin avêtin û girtin.


Rojnamevan Farûk Sakik her wih got komkujiya Roboskê, Ceylan Onkol pir bandor lê kiriye. Dema ku pirtûk amade kiriye psîkolojiya wî ne baş bûye, niha tedawiyê dibîne û her şev di xew de li qadeke şer e, li girtîgehê ye û din av kaosê de ye û dibêje, ''Ev bûyerên wiha kariger û li ser civakê şopa xwe hiştine, di bîrê de mane, diviya mayinde bibûna, ji bo nifşên nû bihatana veguhaztin. Bi vê fikre min ev pirtûk amade kir.''…***ANF***

## Rêya Mihemed Şêxo dişopîn e



Şagirtê Mihemed Şêxo, Îsa Mihemed rêya mamosteyê xwe dişopîne û ev 35 sale bi hezkirinek mezin li amûrên mûzîkê dide û wan dikire û difroşe.

Gelek kes hezkirin û wateya mûzîkê cuda cuda pênase dikin. Îsa Mihemed ê 50 salî mûzîkê wekî hevaleke xwe yê herî nêzîk pênase dike. Hevaltiya wî ya bi alavên mûzîkê re gelek mezin e. Mihemed di 15 saliya xwe de dest bi lêxistina tembûrê û gotina stranan dike. Birayê Îsa, Nezîr Îsa heval û şagirtê hunermend û dengbêjê Kurd ê bi nav û deng Mihemed Şexo bû. Îsa jî bi riya Mihemed Şexo û birayê xwe mûzîkê nas dike. Di 15 salî ya xwe de bi hevalêkî xwe re pere kom dike, herdû bi hev re tembûrekê dikirin. Hêdî hedî



xwe fêrî tembûr û amûrên mûzîkê dike. Despêkê di dawetan de li tembûrê dixe û bi navê Îsa yê tembûrvan tê naskirin.

### EZ JI MIHEMED ŞÊXO BI BANDOR BÛM

Hezkirin û hewildana Îsa ya ji mûzîkê dibe sedema pêşketin û gavavêtinê. Îsa, derbarê naskirina wî ya ji mûzîkê re ev tişt anî ziman: "Bandorbûna min a bi Mihemed Şêxo hişt ez werim vê astê. Dema min dest bi mûzîkê kir; min xwe di nava cîhaneke cuda de dît û pir bandorbûm. Rûhê min zindî bû û axa miriyan ji ser min hate avêtin. Nasîna Mihemed Şêxo ji bo min şans û derfetekî pir mezin bû. Mihemed Şêxo her dem hewildida ku ciwanan fêrî mûzîkê bike û ji bo pêşketina mirovan hewldanek mezin dida."

Îsa da zanîn ku ew gotina Mihemed Şêxo ya "dest ji hûnerê bernedin û stranên kurdî berdewam bikin" tu caran ji bîr nake, heta roja îro ji bo pêkanîna gotina hunermendê mezin kar û xebatên xwe didomîne.

Îsa ev 25 sale li Sûka Qamişlo dikana amûrên mûzîkê vekiriye, amûrên wek tembûr, ûd, gîtar, erbane û bilûrê difroşe. Îsa amûran ji bajarê Şamê dikire û tine Qamişlo.

### ZAROKAN JÎ FÊR DIKE

3 kur û 2 keçên Îsa hene. Îsa hezkirina xwe ya mûzîkê bi wan jî re parve dike. Di heman demê de zarokên ku dixwazin fêrî amûrên mûzîkê bibin, fêr dike û xwestekên wan pêk tîn e. Îsa diyar kir ku ji beriya 35 salan derfetên wan ên kirrîna amûran tune bû û wiha axivî: "Îro li hemû malan amûrên mûzîkê hene. Ciwanên me bi mûzîkê re bûne yek û xwedî lê derdikevin. Ev jî moral û keyfxweşiyê dide me."

### MUZÎK HESTÊ MIROVAN E

Îsa destnîşan kir ku heger mûzîk nebaya wê hestên mirovan tune ba, mûzîk çand û hebûna gel e, muzîk jiyan bi xwe ye. Îsa da zanîn ku mûzîk bûye hevalê wî yê herî nêzîk û got: "Demên ez pir hestyar dibim, dest didim tembûra xwe û hestên xwe parve dikim. Tembûr gûhdarvana herî mezin a êş û keyfxweşiya mirove. Ez û tembûra xwe bûne hevalê hev û 24 saetan bi hevre ne. Tembûr bûye parçeyek ji laşê min."…***ANHA***

## Kurd çareseriyê bi rêya aştiyê dixwazin



**Derwêş M. FERHO**

Navê11'mîn pirtûka rêzdar Hugo Van Rompaey e. Her 11 pirtûkjî li serKurdan in. Di nava 27 salên parlementeriyê û 17 sal şahredarî, bi nasnavê Hugo De Kurd dihate nasîn. Ango Hugoyê Kurd.

Dema di 1988 de Kurdên Başûr, bi taybetî Helebce, bi çekên kimyewî hatin bombebarankirin, Hugo Van Rompaey soz da ku pirsgirêka Kurdan ji wê rojê paş de di jiyana xwe de bike yek ji mijarên sereke. Di dema parlementariya xwe de, bi sedan pirs, pêşniyar, proje pêşkêşî hikûmeta xwe û dezgehên dewleta Beljîka kir. Çendîn car berê xwe da Kurdistan û bi berpirsiyarên Kurd re axivî, şewirî, xebat kir. Di navbera 2003 û 2018 de doktora xwe li ser pirsgirêka Kurd pêkanî û heta niha ji 6 fakulteyan dîplome stendiye.

De salên 90de bi şêwra serokwezîrê Beljîkayê wê demê Jean-Luc Dehaene, H. Van Rompaey xwest di qada dewletî de hin gavan biavêje. Armanc ew bû ku bi serokatiya tevgera Kurd re hevdîtin pêk were û di qada navneteweyî de hin gavwerin avêtin. Lê ji sedema pirsgirêkên navbera Suriyê û Turkiye ev yek pêk nehat.

Di 1998 de rêber Apo hat Roma. Hugo Van Rompaey çû serdana wî û pê re hevdîtineke dirêj çêkir. Di vê hevdîtinê de Rêber Apo li ser14 xalan bi ferehî axaftibû. Hugo Van Rompaey di her 11 pirtûkên xwe de bi ferehî û bi girîngî li ser van 14 xalan radiweste. Ev xal, bi kurtasî ev in: Kurd li Bakur di nava sînorênTurkiyê de li çareseriyê digerin. Pêkhatina demokrasiyê û bi amadekirina qanûna bingehîn ji nuh ve şerrt e. Demokrasiyeke pirr dengî, pirr kultûrî, û pirr olî. Nasîna nasnameya Kurdî di qanûna binegîn de. Mînakên sîstemên Beljîka, Swîsre û Spanye dikarin bibin rêgez jiTurkiyê re. Rawestana operasyonên leşkerî ji aliyê dewletê û tevgera Kurdî şert e. Komîsyoneke navneteweyî di pêvajoya dîtina çareseriyê şert e. Çareseriyeke acîl ji bo girtiyên siyasî, hilweşandina sîstema cerdewaniyê, pêkanîna vegera bi sed hezaran penaber û cih guhastiyan. Di pêvajoya çareseriyê de her du hêz, Turkiye û Tevgera Kurd, li ser masê hebin. Lêgerîn û peydakirina çareseriya pirsgirêkên aborî li Bakurê Kurdistan. Dezgehên îdarî û hiqûqî li Bakur divê qanûnî bin. Rola Ewropa di pêkanîna çareseriyê de divê aktîf be. Serokê tevgerê di nav de, bi hezaran alîgirên PKK gerek bi awayekî dirustî werin qebûlkirin, rewşa wan ya penabertiyê ciddî were girtin. Ji bo sûcên dijî mirovahiyê werin tespîtkirin Komîsyoneke navneteweyî ya Edalet û Rastiyê were avakirin û xebateke bêalî pêk bîne.

Di vegera xwe de bi gelek dezgeh û rayedarên Beljîkî re şêwirî. Bi parlementerên ji partiyên cuda re li çareseriyê geriya. Û dît ku bêdengiyeke bêbext li ser pirsgirêka Kurdan di nava siyaseta Ewropiyan de heye. Dît ku dewletên heyî ji sedema berjewendiyên navdewletî, xwe kerr û lal dikin. Dît ku medya di bin tesîra siyaseta dewletî de ye û dît ku tesîra siyasetaTurkiyê, Iraq, Îran û Suriyê li ser tewra van heye.Heta bi saziyên civakî ku di qada navneteweyî de roleke mezin dilîzin li ser pirsgirêka Kurd bêdeng in. Ji bo vê bêdengî û bêbextiyê protesto bike bi Kurdan re kete grêva birçîbûnê. Û dema polîsê Beljîka avêt ser dezgehên Kurd û Med TV, karîna xwe ya şahredariyê pêkanî û televîzyonaTurkiyê TRT ji ser antena herêma xwe rakir. Ev yek bû sedema krîzeke navdewletî.

Naveroka 11'mîn pirtûka Hugo Van Rompaey mijara doktora wî ye ku 14 salan li ser xebitiye. Ji bo naveroka doktora xwe bi awayekî zanistî pêşkêş bike ne bes çû Kurdistan. Ew her weha li nav Kurdên Ewropa, Ermenîstan, Gurcistan, Kazakistan û Rusya geriya. Li gelek zanîngeh, pirtûkxane, arşîv û dezgehên cuda geriya. Nêzî 6 hezar pirtûk û bi hezaran document xwend û ber bi çavkir.

11'mîn pirtûka Hugo van Rompaey, Kurd çareseriyê bi rêya aştiyê dixwazin, di roja 13.06.2018 de, li parlementoya Beljîka bi beşdariya akademisyen, siyasetvan û medya tê nasandin.

# Efrînî li Şehba projeyên aborî pêş dixin

***Şêniyên Efrînê yên ku ji ber êrîşên dewleta tirk neçarî derketina ber bi Şehbayê çûn jiyana xwe û projeyên xwe yên aborî bi pêş dixin û berxwedana xwe berdewam dikin.***

Bi hevkariya Komîteya Aborî ya herêmê welatiyê bi navê Îsa Hac Mihemed kargeheke dirûnê li navçeya Arfad (Til Rifeet) vekir.
Piştî ku bi sedhezaran welatiyên Efrînê ji ber hovîtiya êrîşa artêşa dagirker a Tirkiyeyê û komên çete yên girêdayî wê li dijî kantona Efrînê neçarî koçberiyê bûn. Welatiyê bi navê Îsa Hac Mihemed karibû maşîneyên xwe yên dirûtinê bi xwe re ji Efrînê derbixîne.
Îsa Hac Mihemed niha bi hevkarî û alîkariya Komîteya Şêwirkarî û Aboriyê kargeheke dirûtinê li navçeya Arfad vebike.
Îsa Hac Mihemed diyar kir ku ew cil û bergên jin û mêran çêdikin û li gundên Şehba difiroşin.
Di vê kargeha dirûtinê de 31 xebatkar dixebitin. Îsa Hac Mihemed ji navçeya Meydankê ye û kargeha wî ya çêkirina cilûbergan li wir bû.
Hêjayî gotinê ye ku rêvberiya xweser û rêveberiya Kampa Serdem û berxwedan her wiha rêveberiya



Şehbayê ji bo şêniyên Efrînê wê gelek projeyên aborî bi pêşbixin ta ku şênî bikaribin debara jiyana xwe bikin.



## Komîteyê Dest bi wergertina genim kir

Komîteya Aborî ya navçeya Eyn Îsa ya kantona Girê Spî ji bo wergirtina berhemê genim ji cotkaran embar vekir. Komîteya buhayê kirîna genim (hişk û nerm) li gorî asta başbûna wê destnîşan kir. Buhayê yek ton asta yekem 175 hezar lîreyên Sûrî ye, asta duyem 173 hezar û 250, ya sêyemîn jî 171 hezar û 500 ji bo tonekî.
Wergertina genim bi riya komînan bi rêve diçe.
Berpirsyarê navenda wergertina genim Salih Xidir anî ziman ku tenê yek navend li Eyn Îsa û gundewarên wê ji bo wergirtinê heye û ji saet 07:00 heta 17:00 deriyê embarê vekirina û pêşwaziya cotkaran dike.
Salih Xidir da zanîn ku komîte genimên salên berê yên hatine xezinandin, wernagirin, tenê yên îsal werdigirin.
Komîte piştî 15 rojan ji wergertina genim dê pereyan bide cotkaran.



## Ji ber germê diçin binê siya sûrên dîrokî

Ji ber germê, ku di meha Remezanê de gelekî dijwar e, welatiyên Amedê berê xwe dan bin siya sûrên dîrokî û parkan.
Şêniyên Amedê ji bo xwe hinekî hênik bikin, li binê sûrên dîrokî, gulîstan û li bin siya daran li hev dicivin. Gelek ji welatiyên bajêr li bin siya sûrên Amedê, Parka Orman, Parka Rihan û Parka Sumer vedikevin.



Pispor ji ber germa dijwar hişyariyê didin û dibêjin; ji ber germ nêma zêde dibe ku xwîn biçe ser mejî, nexweşiyên dil û reh rû bidin. Bi taybetî hişyariyê didin nexwşeên dil ku hay ji xwe hebin. Her wiha bang li welatiyan dikin ku zêde spora giran nekin û gelekî avê vexwin. ***ANF***

## Çanda civakên klan berdewam e



Pevguhertina xwarinan di navbera cîranan de bi taybet di cejn û munasebetan de kevneşopiyeke gel a kevnar e. Welatiyên Tebqa jî weke bajarên din ên derdorê rê û resmên meha Remezana pîroz didin meşandin û cîran şîv û xwarinên fitarê pev diguherin. Herêma Tebqa di meha Remezana pîroz de gelek kevneşopiyên xwe diparêze. Di vê meha pîroz de cîran şîv û xwarinên fitara pevdiguherin. Ev kevneşopî têkliya di navbera cîranan de nîşan dide û wateya hezkirinê diyar dike.
Dibe ku ev kevneşopî girêdayî serdema Neolotîk be ku endamên Kilan hilberîna xwe ya zêde belav dikirin û komkirin û malgirtin weke sûcekê digirtin dest.
Li bajarê Tebqa di dema fitara Remezanê de zarok şîv û xwarinan bi cîranan re pevdiguherin.
Her wiha şîraniyên taybet bi herêmê jî pev diguherin. Sifreya fitara Remezanê ya her malbatekê gelek cûre xwarin li ser datên. Sifreya malbatên heman kolanê hema weke hevûdu ne.
Yek ji rêzdariyên meha Remezanê ku welatiyên Tebqa pêk tînin, birajtina goşt e. Welatiyên Tebqa ji bo li hemberî xizanan rêzdar bin goşt nabirêjin û tenê ji xwaringehan dikirin.
Her wiha yek ji kevneşopiyên welatiyên Tebqayê li ser rihê miriyên xwe qurbanan serjêdikin û goşt li xizanan belav dikin. Ev kevneşopî hêjî li ba malbatên xwenedan berdewam e.
Li ser sifreya meha Remezana pîroz ava sûsê cihekî girîng digire û weke vexwarina fermî ya vê meha pîroz e.
Yek ji xwarinên Tebqayê ku welatî di dema siharê de dixwin “Henînî” ye, Henînî xurme ne û bi rûnê sax hatiye kelandin û li rex wê dew tê vexwarin.
Welatiyên Tebqayê piştgiriyê didin zarokên xwe da ku rojiyê bikin û di rojên destpêka rojiyê de jêre dibêjin rojiya xezalan ango zarok dikarin heta nîvroj rojiyê bigirin û ji bo zarok rojiyên xwe berdewam bikin pereyan ji bav û dayîkên xwe werdigirin. ***ANHA***

## Rêwîtiya koçberan a ber bi Qendîl ve




Bi hatina werza Havînê re û destpêkirina germê re, koçberî û rêwîtiya niştecihên gundên Pişder a ber bi zozanên Qendîl ve destpê dike.
Ji destpêka meha Gulanê ve, niştecihên gundên Dugman, Zenglan, Girtik, Pîran, Maxûmezin, Resu Haciyan yên herêma Pişder girêdayî herêma Raperîn a ser bi Silêmaniyê ve, berê xwe didin zozanên Qendîlê.
Salane li Herêma Kurdistanê, welatiyên li gundan dijîn bi taybetî herêmên çiyayî, ji bo çandinî û lawirvaniyê bi hatina werza Havînê re berê xwe didin cihên fênik yanî zozanan. Herêma Qendîl yek ji wan herêmane ku herî zêde xelk Havîna diçinê. ***ROJNEWS***

## li Çiyayê Kizwana Navenda çandê hate vekirin



Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Hesekê li gundê El-Xera yê Çiyayê Kizwana navenda xwe bi merasîmekê Bi armanca pêşxistina çanda şêniyên herêmê û belavkirina çand û huner li Çiyayê Kizwana navend bi merasîmekê hat vekirin.
Bi dehan şêniyên herêmê û şandeyek ji komîteya Çand û Hunerê ya kantona Hesekê beşdarî merasîma vekirina navendê bûn. Merasîm bi rêzgirtin hate destpê kir. Paşê yek ji rêveberên Tevgera Çand û Huner a herêma Cizîrê Nûra El-Wegaa axivî û diyar kir ku ji bo xwesteka rewşenbîr û zarokên herêmê pêk were, wan navenda xwe li herêmê vekir.
Nûra di berdewama axaftina xwe de got ku wê navend alîkariya zarokan bike da ku xwe di aliyê çandî de pêş bixin.
Di berdewama merasîmê de Hevserokê Meclîsa Kantona Hesekê Abdulxenî Oso axivî û bi xêr hatina beşdaran kir û spasiya her kesê ku hewil dide aliyê çandî li hermê pêş bixe, kir.
Abdulxenî di berdewamiya axaftina xwe de jî got ku bi saya şervanê YPJ/YPG`ê herêm ji çeteyên DAIŞ`ê hatiye rizgarkirin û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Şervanan evsaneyên lehengî di Çiyayê Kizwanan de nivîsandin û tu carî lehengiya wan nayê jibîrkirin.”
Di dawiya merasîmê de navend ji aliyê dayîka şehîd Abdulwehab Abdulezîz ve hate vekirin.




## Dema derketina li dijî dagirkeriyê ye



Nerazîbûnên li hember dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser xaka Başûrê Kurdistanê her ku diçe mezin dibe. Di çarçoveya qonaxa duyem ya pêngava ‘Serî Hilde’ de, Jinên Ciwan ên Tekoşer û Komeleya Ciwanên Welatparêz ên Kurdistanê, daxuyaniyek çapemeniyê li hember dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser Başûrê Kurdistan, li navenda xwe ya bajarê Silêmaniyê dan.
Di daxuyaniyê de bang li gelê kurd hat kirin ku ji bêdengiya xwe derkevin, bêdengî wateya rewakirina dagirkeriyê ye. asta ku dagirkerî gihayê ku leşekeran derbasî xaka başûr dike, rewşeke metirsîdar e.

Di dawiya daxyaniyê de wiha hate gotin; “niha dema Berpirsyartiya dîrokî li ser milê me ye û em amadene. Em wek jinên ciwan, çawa ku me li hember êrîşên hovane yên Tirkiye ên li ser Rojavayê Kurdistanê berxwedan kir, bi heman awayî emê li hember hatina leşkerên Tirk a nava xaka Başûrê Kurdistanê jî bisekinin û helwesta xwe bidin nîşandan.”



# Jinên Şengalê bi gelê Efrînê re ne

***Di çarçoveya Pêngava “Jinên cîhanê ji bo Efrînê serî hildin” de ya ku ji aliyê Rêxistina Kongreya Star ve bi armanca destekdayîna bi gelê Efrînê re hatiye birêxistinkirin li ser navê Jinên Êzidî Hevseroka Desteya Rêveber a Xweseriya Şengalê Zehra Silêman, Rêveberiya Tevgera Azadiya Jinê (TJAÊ) Zehrî Şemp hatin Rojava.***

Li ser navê jinên Êzidî yên Şengalê, du jin bi armanca destekdayînê bi gelê Efrînê re yên li Şehbayê hatin Rojava.
Aliyê Êzidî, di serî de serdana Navenda Kongerya Star a li bajarê Qamişlo kir û ji aliyê Berdevka Kongreya Star a Rojava Evîn Siwêd, Rêvebera Kongreya Star a Efrînê Wehîda Xelîl û Rêvebera Komîteya Têkiliyên Diplomasî a Kongreya Star Mekiya Hiso ve hatin pêşwazîkirin.
Hevseroka Desteya Rêveber a Xweseriya Demokratîk a Şengalê Zehra Silêman axivî û diyar kir ku buyerên ku li Şengalê rû dan vê carê li Efrînê bi destê dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê dûbare dibe.
Zehra Silêman anî ziman ku, rexmî ku gelê Şengalê rewşek zehmet jiyan dikin, lê dibînin ku erka wan e destekê bidin gelê Efrînê.
Evîn Siwêd jî diyar kir ku alîkariya ku gelê Şengalê ji gelê Efrînê yên li kampa Şehbayê re şandine nîşan dide ku gelê Şengalê bi dil û can bi Efrînê ne.
Jinên Êzidî alîkariyên ku ji bo gelê Efrînê re kom kirine radestî Kongreya Star kirin da ku bişînin kampên li kantona Şehbayê.






## li Stockholmê banga boykotkirina Tirkiyeyê kirin

Komek ji jinên Kurd, li paytexta Swêd Stockholmê daketin qadan û bang kirin ji bo dewleta Tirk bê boykotkirin.
Jinan li kolana Drottningsgatanê bi pankarta bi nivîsa “Tirkiyeyê boykot bike” meşiyan û li ser komkujî û êrîşên dagirkeriyê yên bi destê dewleta Tirk tên kirin, belavok belav kirin.
Çalakiya jinên Kurd bala welatiyên Swêdê kişand û Swêdiyan diyar kirin ku divê Tirkiye bê boykotkirin.
Yek ji çalakgeran Ayşe Goktepe ji ANF’ê re axivî û got, “Çalakiya me gelekî bal kişand. Gelek Swêdî û biyanî hatin cem me û destek dan me. Gotin ku ‘divê Erdogan û dewleta Tirk bên boykotkirin’. Kome ji tûrîstên ciwan ên Tirk jî hatin cem me û ji me pirsîn bê çima dixwazin Tirkiye bê boykotkirin. Me jî ji wan re qala binpêkirina mafên mirovan, zext û zordariyên dewleta Tirk kirin. Wan jî heq dan me û gotin ku wê deng nedin Tayyîp.”
Goktepe bang li Kurdistaniyên li Swêdê dijîn kir ku bi awayekî çalak tevlî kampanya boykotkirina Tirkiyeyê bibin. ***ANF***


## Jiyanek tijî têkoşîn

Merala biçûk ya di darbeya 12’ê îlonê de ku di 12 saliya xwe de hat girtin û xistin girtîgeha Amedê niha ji Rihayê namzeda HDP’ê ye. Meral Balter ya li Kurdistanê li dijî zîhniyeta mêr têkoşîn da û di berxwedana Geziyê de jî cih girt, jiyana xwe bi têkoşînê derbas kiriye.

Meral Balter ji rêza 13’emîn namzeta HDP’ê ya Rihayê ye. Meral zaroka yekem a malbatê ye û keça bavekî mamoste û dayikek kedkara malê ye. Bavê wê surgûnî Yozgatê tê kirin, lê bavê wê tê li Amedê bi cih dibe û li şaredariyê dixebite. Di 1977’an bavê wê di kuştinên kiryar nediyar de tê qetilkirin. Malbat dîsa vedigere Hîlwanê. Dayika wê Emîne Haci Yusufoglu di 1978’an de di şaredariya Hîlwanê de wek yekem jina endama meclîsê tê hilbijartin.

Meral diyar dike ku di 1978’an de têkoşîna azadiyê nas dike û got di 1980’ê de di 12 saliya xwe de hatiye girtin û di girtîgeha Amedê de maye. Meralê got: “Wê demê Gultan Kişanak jî hebû. Di nasnameyê de temenê min 14 bû lê ez bi rastî 12 salî bûm. Her kesî ji min re digot ‘Merala biçûk’. Ez 6 mehan girtî mam.”

Meralê wiha berdewam kir: “Ez ji



girtîgehê derketim min li 4 xwişk û birayên xwe nêrt. Ya herî biçûk 3 salî bû. Dayika min 4 sal û nîvan di girtîgehê de ma. Ez neçûm dibistanê jî. Ez û xwişk û birayên xwe tenê man. Xizmên dê û bavê min jî em nexwestin. Em bê dê û bav man. Kesî silav nedida me. Dema dayika min ket girtîgehê jinek 28 salî bû. Piştî vê min tu car dest ji têkoşînê berneda.”

**‘HEVJÎNÊ MIN KRÎZ DERBAS KIR’**

Meralê bi lêv kir ku çawa dayika wê ji girtîgehê derketiye çûne Stenbolê cem xalê xwe û piştî vê jî dest ji têkoşînê bernedane. Meralê diyar kir ku hevjînê wê jî di rêveberiya Sendîkaya Kedkarên Buroyê de bûye û bi KHK’ê ji kar hatiye avêtin û piştî vê krîza dil derbas kiriye û jiyana xwe ji dest daye.

Meralê got li Stenbolê di demên HADEP û DEHAP’ê de xebat meşandiye û bi taybet bi malbatên koçber re xebat meşandiye.

Meral ya niha gopal bi kar tîne, destnîşan kir ku di dema Geziyê de birîndar bûye û wiha pê de çû: “Polîsan êrîşî me kir û hemû kes bi ser hev de ketin. Hestiyê kulîmeka min pelçiqî. Piştre jî ez baş nebûm. Ez di temên biçûk de mexdur bûm niha jî hatim mexdûrkirin. Ji bo pergala faşîst têk biçe çi ji destê min bê ez ê bikim.

**‘HDP SÎWANEYA GELANE’**

Meralê daxuyakirin ku HDP sîwana gelan e û got her kesî hembêz dike û ji ber vê HDP tercih kiriye. Meralê ev tişt anî ziman: “Li Rihayê 14 namzet hene û hêviya me ev e ku her 14 heb jî biçin meclîsê. HDP di heman demê de partiya jinê ye. Em ê gelek tiştî bi hev re bi ser bixînin. Li seranserê welat wê gelek hevalên me biçin Meclîsê. Em hedef dikin ku pêşî li kuştina jin û zarokan bigirin. Pêşî li îstîsmarê bigirin.” ***JINNEWS***

## Namzet: Em bi kêfxweşî tên pêşwazîkirin



Namzetên HDP’ê yên jin ên li Îzmîrê Cemîle Aydin, Ayşe Yilmaz, Elfeyse Nas, Gonul Aygun û Rahîme Tûran qala armancên xwe kirin.
Cemîle Aydin ku yek ji dayikên aştiyê ye, anî ziman ku bi salan e ew ji bo aştiyê têdikoşe û ji bo mafên jinan biparêze bûye namzet.
Ayşe Yilmaz diyar kir ku heta niha wan li gelek semtan karê hilbijartinê kirine, li navçeyan li nava malan û bazarê belavok belav kirine û got, ew bi baldarî û kêfxweşî tên pêşwazîkirin.
Elfeyse Nas jî bal kişand ser eleqeya ji HDP’ê re tê nîşandan û got, “Em ji vê baldarî û pêşwaziyê gelekî kêfxweş in.”
Gonul Aygun jî da xuyakirin ku karê wan ê ji bo hilbijartinê bi coş derbas dibe û got, “Gelê me êdî fêhm kiriye ku bêyî HDP’ê desthilatdariya 16 salan nikare bê têkbirin.” Aygun diyar kir ku ji bo li meclîsê bibe dengê jinan ew bûye namzet.
Rahîme Tûran jî destnîşan kir ku namzetên HDP’ê bi kelecaneke mezin li Îzmîrê tên pêşwazîkirin û got, “Ez bawerim ku em ê bi ser bikevin.” ***ANF***

## Dayikên beşdarî berxwedana Şêxmeqsûd bûne

Ji beriya 4 salan ve, ango di dema êrîşên çeteyan ên li ser taxa Şêxmeqsûd de dest pê kirin de, bi rengekî komînal li kêleka parastvanên taxê sekinîn û xwarin ji wan re çêdikirin û heta niha di metbexê de dixebitin.
Çîrokên berxwedanê yên Taxa Şêx Meqsûd bi hezaran e. li taxê ne tenê şeravan berxwedanî dikirin, gel jî di nav de dayîk berxwedanek gelek mezin nîşandan. Hejarmeke jinên taxa Şêxmeqsûd a Helebê di dema êrîşên komên çete yên li ser taxê, digel şertên zor û zehmet de bi şêwazê xwe li derdora parastvanên taxê kom dibûn û xwarin ji wan re çêdikir.



Dayik, rojane ji saetên berbangên sibehê heta derengî şevê newbedariya metbexê dikirin û xwarin ji şervanan re çêkirin û dişandin eniyên berxwedanê.Piştî êrîşên li ser taxên bi dawî bûn jî, metebex nehatiye girtin, dayik heta niha jî xwarinê amade dikin û dibin ji şervanan re .
Ji dayikên ku ji beriya 4 salan ve di metbexê de bi dildarî kar dike, Lutfiya û Sultana ne.Dayika Lutfiya Ebdo ya 53 salî derbarê karê xwe yê di vê metbexê de wiha têne ziman, “Karê min ê li vir wekî xwedîkirina dayikekê zarokên xwe. Wekî her ferdek ji taxê erka me ye em xwedî li şervanên ku parastinê dikin, derkevin. Em jî dayikên t vê taxê ne em xwarinê ji şervanan re çêdikin.”Çeteyan metbex kirin armanca xwe
Dayika Lutfiya jî diyar kir ku metbex jî rastî êrîşên çeteyan hate û wiha anî ziman, “Rojek topek çeteyan li taxê ket. Dayikek sivîkî birîndar bû .Li ser vê yekê me parastina metbexê xurt kir û me çend cihên din jî diyar kir, dema ku xeterî li ser yekê hat em biçin a din.”Lutfiya û Sultana di gel çêkirina xwarinê de, xwarinan ji bo demê pêş depo dikin, wekî “Dimsa bacana, zebzeyên kesidandî, penêr, zeytûn û mekdûs, rêçal”.
Sultana Hesen, ya 51 salî got, “Rexmî dijwariya êrîşan min dev ji taxê berneda, em bê teredud piştgirî didin şervanan. Hêza me zarokên me ne, ew ên ku li çeperên şer parastinê dikin.” ***ANHA***


## AKP bi hestên zarokan dilîze !

Heyta AKP’ê ya ku di xebatên hilbijartinê de çû serdana gundê Hêştekê yê girêdayî Rezana Amedê hat îdakirin ku li zarokan bîsîklet belav kiriye. Niştecihên gund diyarkirin ku ji bo dengê xwe bidin wan li zarokên wan bîsîklet hatine belavkirin û anîn ziman ku fînansor jî Halk Bank e.

AKP’ya ku 16 sal e li ser desthilatdariyê ye hemû çavkaniyên tirkiyeyê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne û çadên çandî hemû hilweşandin. Vê carê jî wekî ku di hemû hilbijartinan de kir dîsa devê kîsik vekir. AKP’ya ku di bin navê piştevaniya civakî de li gel makarne û pere belav kir, vê carê jî li gundê Hêştek yê Baglarê li zarokan bîsîklet belav kirin.

Bi destpêka pêvajoya hilbijartinê re AKP’ê berê jî li Baglar û Sûrê li gel hewaya germ komir belav kir û ev helwesta AKP’ê jî aliyê gel ve rastî bertekan hatibû.

Hat îdakirin ku bi hevkariya Muduryeta Saziya Perwerdeya Millî û Halk Bankê li zarokan ji 50 zêdetir bîsîklet hatine belavkirin. Welatiyên ku bertek nîşanî vê helwesta AKP’ê dan diyar kirin ku ji bo ew dengê xwe bidinê AKP’ê ev kar kiriye. ***JINNEWS***



## Rûsya dixwaze Îranê ji Sûriyê derxe

Ezîz KOYLUOGLU

Di navbera Emerîka, Rûsya û herî dawî bi beşdarbûna Îsraîl li ser Sûriyê bazarek pirr alî tê maşandin. Îsraîl hebûna Îran li nava Sûriyê ji bo xwe wek metirsiyek mezin dibîne û dixwaze hebûna wê li Sûriyê nemîne. Ji bo vê jî li ser Rûsya bandora xwe bikartîne û dixwaze bi rêya Rûsya, Îran ji nava Sûriyê derbixe. Li gor tê dîtin di hevdîtinên dawî yê rayedarên wezareta parastinê ya Rûsya û Îsraîl wek gava yekemin wê hêzên Îranê ji başûrê Sûriyê vekişin. Ew wek gava yekemin e û xuya ye wê gavên din jî were.
Çima?
Îran ji destpêka aloziya li Sûriyê bi mebesta parastina xwe parastina Sûriyê di erdê de girt ser xwe. Ji 2012'dan heta niha bi hezaran pastarên Îranî li Sûriyê hatin kuştin û birîndar bûn. Di şerê 7 salan de eşkere bû ku bê parastina Îran, rejîma Sûriyê nikaribû xwe liser nigan bigirta û wê hilweşiya. Dîsa Hîzbûllaha Lubnan wek beşek ji hêzên Îranê rolek cidî di parastina rejîma Sûriyê lîst. Rola Îran ne tenê di parastina çekdariya Sûriyê de, diwarê aborî de jî heta niha yê rejîma Sûriyê dimeşîne Îran e. Lê ev dem hêdî hêdî bidawî dibe.
Rûsya wek hêzek parastina rejîma Sûriyê di ezmanî de ji 2015'an heta niha rolek girîng ji bo rejîma Sûriyê dilîze. Ne tenê di parastina ezmanî ya rejîma Sûriyê de, di platformên navnetewî de bi taybet di Netewên Yekbûyî de parastina rejîma Sûriyê dike. Ev jî wek siwanek parastinê di qada navnetewî de ji bo rejîma Sûriyê ye.
Îran û Rûsya wek du hêzên ji bo parastina rejîma Sûriyê di yek eniyê de cih digrin. Piştî heft salan ji aloziya Sûriyê êdî bi temamî Rûsya, hebûna Îranê di Sûriyê de berjewendiyê de nabîne. Bi taybet piştî hevdîtinên Astana despêkir û navbera Tirkiyê û Rûsya baş bû, têkiliyên Îran û Rûsya hinek din jî li ser Sûriyê nebaş bûn. Dagirkeriya dewleta Tirk ya lı herema Cerablus û Bab, bi sernavê çavdêriya agirbestê navenda li Idlibê û herî dawî dagirkirina Efrîn, nakokiyên Rûsya û Îran kurtir kir. Beşdarkirina dewleta Tirk ya dagirker nava Sûriyê bi destê Rûsya, Îran wek li dijî berjewendiyê xwe dît û car car xwest li dijî ev siyaseta Rûsya helwest jî nîşan bide. Lê li Heleb, Tedmûr hate dîtin ku, Rûsya bi balafiran êrîşî navendê pastarên Îranê kir û tehdît kir.
Ev demeke li ser hebûna hêzên Îranê li Sûriyê nîqaşên pirr alî tên meşandin. Rûsya bi lihevkirina bi Tirkiyê herêma Idlib, Efrîn, Cerablus, Bab û Ezaz niha ji Sûriyê qut kiriye. Dîsa bi hevdîtinên bi Urdin û Îsraîl re herema Deraa dixwaze radestî Urdinê bike. Ev siyaseta Rûsya ya li ser perçekirina Sûriyê, ev demeke bi Emerîka re jî dinava danûstendinê deye.
Li beramberî vê siyaseta Rûsya ya perçekirina Sûriyê, Îran wek astengiyeke. Ji bo wê Rûsya ev demeke bi rêya Îsraîl li ser hêzên Îranê li Sûriyê êrîşan pêktîne. Li gorî Rûsya êdî Îran li Sûriyê ne wek alîkarek siyaseta wê, wek astengiyeke.
Hevdîtinên sê alî yên Astana bimeşin jî, di wan hevdîtinan de xuya dibe ku rola Îranê nemaye. Berovajî wê dibe zemîn ku jinavbirina Îranê li Sûriyê. Niha Rûsya li paş perdê serkêşiya jinavbirina Îranê li Sûriyê dike. Lê Rûsya jî dizane Îranê bi carekî nikare jinava Sûriyê derxe. Ji bo him zextên Emerîka him jî êrîşên Îsraîl ji bo wê wek hincet derdixe pêş. Hevdîtinên dawî yên Îsraîl û Rûsya jî hinekî bi vê armancê pêk hatin. Hevdîtina Beşar Esad û Pûtîn jî mijara yekê hêzên bîyanî ji Sûriyê derxistinbûn. Îran jî ger bixwaze hebûna xwe li Sûriyê bipareze divê li Sûriyê dostên xwe zêdebike. Bi taybet li bakûr rojavayê Sûriyê.

# 'Tecrîd herî zêde ZIYAN DIDE Tirkiyê'


***Siyasetmedar û rewşenbîrên navçeya Tirbespiyê diyar kirin ku hikûmeta AKP'ê hewl dide gelên herêmê ji fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dûr bixîne û di vê derbarê de tecrîdeke hişk li ser Ocalan ferz dike. Siyasetmedar û Rewşenbîran her wiha piştrast kirin ku di vê tecrîda li ser Ocalan de herî zêde Tirkiye ziyanan dibîne.***

Hikûmeta AKP'ê tecrîdeke hişk li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz dike. AKP'ê ji sala 2011'an ve serdanên parêzerên wî qedexe kirine û ji îlona 2016'an ve serdana malbata wî jî qedexe kiriye.
Girêdayî mijarê hin siyasetmedar û rewşenbîrên navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo ji ajansa me ANHA'yê re axivîn û diyar kirin ku hikûmeta AKP'ê bi riya vî şerê xwe yê taybet hewl dide gelên herêmê ji fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dûr bixîne.
Endamê Rêveber ê Partiya Yekîtiya Demokratîk Silêman Hisên got ku gelên herêmê fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji xwe re xelasî digirin dest û wiha got: "Dewletên komploker ên dijberiy agelê Kurd dikin nikaribûn fikra Ocalan sînordar bikin, nemaze niha fikra



wî li giştî Rojhilata Navîn tê jiyîn. Her wiha gelek tevgerên rizgariyê yên cîhanê di felsefeya Ocalan de çareseriya herî guncaw dibînin û êdî fikra Ocalan veguheriye sembola gelên bindest."
Endama Yekîtiya Rewşenbîran Merwa El-Hisên girêdayî heman mijarê got ku di nirxandina dîrokê de diyar dibe ku her tim dijminên doza Kurdî û bi taybet dewleta Tirk şerê fikr, çand û serkeftinên Kurdî dike. Merwa di axaftina xwe de got ku piştî gelên herêmê felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nas kirin, Tirkiye tecrîdeke hişk li ser Rêber Ocalan ferz dike da ku rê li pêşiya belavbûna fikra wî bigire.
Merwa behsa êrîşên artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li dijî Efrîn, Kobanê û Şengalê kir û got ku evan êrîş di çarçoveya êrîşên wê yên ji bo tunekirina çanda gelên resen de pêk tên da ku ji rastiya wan a cewherî dûr bicîne û bi hemû derfetên xwe hewl dide gelê Kurd ji rewşa rêberê xwe û tenduristiya wî dûr bixîne.
Endamê Rêveberiya Yekîtiya rewşenbîran Nesar Elî got ku bê agahiyên gelên herêmê ji tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hişt ku hêrsa hemû azadîxwazan zêde bibe.
Elî di dawiya axaftina xwe de wiha destnîşan kir: "Dewleta Tirkiyeyê nikaribû felsefeya Rêber Ocalan sînordar bike, nemaze niha diyar dibe ku sembola jiyana hevbeş a gelên herêmê ye. Tevî ku Tirkiye ne tenê beşdarê komploya navnetewî ye, lê dîsa jî têk çû ji ber ku gelên herêmê nexwestin ji bo berjewendiyên dewletên dagirker bibin amûr." *ANHA*

## Teqez bû ku AKP wê têk biçe



Ji bo hilbijartinên li Tirkiyê û bakurê kurdistanê tenê çend hefte mane. Namzetê HDP'ê Selahatîn Demîrtaş ku di girtîgehê de rehîn tê girtin bi hemû hêzêa ji hundur zîndanê hemleya xwe ya ji bio serokomariyê dike. Vê carê jî Demirtaş li ser medyaya sosyal derbarê rojevê hin peyam dan. Peymanên Demîrtaş wiha ne; ''Referandûma 16'ê Nîsanê, bi hepskirina me, bi komplo û dek û dolaban bi ser xistin. Niha jî, ji bo ku 24'ê Hezîranê bi ser bikevin min girtî dihêlin. Ji bo vê jî, Dadgeha Bilind jî di nav de, li ser hemû dadgehan zextê dikin. Hin dadgerên ku li dosyaya min dinerin, li ber sedema zextan hatin ber îstîfakirinê, jê wêdetir hatin ber asta xwekuştinê. Li gel her tiştî, ez dizanim ku gelek dadgehên birûmet û wêrek hene. Ev pergala zilm û zordariyê 24'ê Hezîranê wê biqede. Wê hiqûq û serxwebûna darazê were pêkanîn, dadger û yên ku têne darizandin jî wê bibin mîsogeriya darazê. Tenê 1 dengî bidin HDP'ê û 1 dengî bidin Demîrtaş.
Teqez bû ku AKP wê di hilbijartinê de bi ser nekeve. Sedema ku bi rengekî bêhtir êrîşkar bi ser min de tenê ev e. Şîrketên ankêtê yên alîgir jî nikarin vê rewşê xilas bikin.
Her kes bila ji rêveberiyeke nû û siberojeke demokratîk re hazir be. Her wiha, ji vê saetê û şûn de bila kes di ber AKP'ê de sûc û gunehan neke, wê tenê malikê li xwe xira bike.
Heke HDP bendê derbas bike wê Tirkiye hilmekê bistîne. Ez bawer dikim ku di hilbijartina Serokkomariyê de bimînim tûra duyan. Tûra duyan e mê tifaqa herî mezin a demokrasiye ava bikin û em ê bi alternatîfeke xurt werin ber gelê xwe. Ev tifaq wê ji Tifaqa Millî berfirehtir be. Teqez em ê vê bi ser bixin."

## Îran ji zextên Rûsiya re serî ditewîne



Di rojên dawî de diyar dibe ku Îran dixwaze li Başûrê Sûriyê bê dengî pêk were, lewma dûrî daxuyaniyên xwe yên berê ku digot tu kes nikare wê ji xaka Sûriyê derbixe, dibe. Lê niha piştgiriya xwe bi pîlana Rûsiya ya valakirina Başûrê Sûriyê ji hemû hêzên biyanî kir.
Îran dest ji daxuyaniyên rotini yên berê derbarê Sûriyê dida û digot tu kes nikare wê mecbûr bike ji Sûriyê derbixe. Lê niha niha piştgiriya xwe ya bi pîlana Rûsiya ya valkirina Başûrê Sûriyê ji hemû hêzên biyanî dike. Da ku rê ji hêzên rêjîma Sûriyê re were vekirin ku herêmê bixe bin serweriya xwe.
Rojnameyek Îranî ya herêmî got ku Sekreterê Meclîsa Bilind a Elekariya Netewî ya Îranê Elî Şemxanî roja şemiyê got ku Îran piştgiriya hewldanên Îranê yên bi ji bo rêjîma Sûriyê, herêmên başûr bixe bin serweriya xwe.
Raporên derketin holê diyar dike ku di navbera Rûsiya û Îranê de itîfaq pêk hatine, ku zext li Îranê û Hiz El-Ah were kirin ku herêmê biterikîn e.
Rojnameya El-Ereb derbarê mijarê de li ser zimanê kesên pspor diyar kir ku bê dengiya Îranê ya derbarê bangên jê re hatin kirin û xwestekên jê hatin xwestin ku hêzn xwe û Huzib El-Ah ji herêmên nêzî Îsraîlê bikşîne, vedigere zextê Rûsiya yên li ser Îranê. Di heman demê de ji ber ku nikare bersiva êrîşên Îsraîlê yên di xaka Sûriyê de li dijî wê pêk tên, bide. Tê gotin ku dibe ji vir kêmkirina hêzên Îranê li Sûriyê destpê bike. Bi vê yekê jî dê xwe dûrî dijberiya aliyên din bike û ew ji vê yekê re ne amade ye.
Rojnameya Şeriq a Îranê jî li ser zimanê Elî Şemxanî got ku ew piştgiriya hewldanên Rûsiya ya derxistina "Teroristan" ji sînorê Sûriyê û Urdinê dikin û wê herêmê bixe bin serweriya rêjîma Sûriyê. Di heman demê de got k utu hebûna şêwirmendên Îranê li herêmê nîne.

## Kartal: em dikarin faşîzma AKP-MHP'ê têk bibin

Serokê KONGR-GEL Remzî Kartal li bajarê Orebroyê yê Swêdê axivî û bal kişande ser êrîşên qirker ên ser siyaseta Kurd. Kartal got, Hevserokê HDP'ê Selahattîn Demîrtaş, hin parlamanter girtî ne û li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran heye. Kartal got, hilbijartina ku di nav van şertan de pêk tê ji bo Kurdan û bindestan çendî girîng e.
Kartal diyar kir ku çavê hemû lehengên têkoşîna azadiyê û yên ku berdêl dane li hilbijartina 24'ê Hezîranê ye û got, girîng e bê Kurd wê çawa bersivê bidin konsepta taybet û şerê dijî Kurdan. Kartal got, "Gelê me wê bikaribin bersivê bidin vê konseptê? Erdogan her tiştî seferber dike. Armanc ew e ku HDP'ê di bin bendê de bihêlin. Heke HDP di bin bendê de bimîne Erdogan wê desthilatdariya xwe qeyîm bike. Heke ji bendê derbas bibe, diyar e bê ka Erdogan û çeteyên wî wê li çi rast werin. Ji bo vê jî bi hemû hêza xwe bi ser HDP'ê û welaparêzan de diçe."
Kartal diyar kir ku Erdogan hemû saziyên dewletê bi dest xistine û her cure neyêniyan bi bikaranîna saziyên dewletê dike. Kartal got, divê hemû Kurdistanî û hêzên demokratîk hay ji vê hebin û bizanibin ku Erdogan çendî bi taloke dilîze.
Kartal bi domdarî got, Erdogan û Bahçelî ji bo HDP'ê di bin bendê de bihêlin her tiştî dikin, hay jê hene ku tenê HDP'ê di bin bendê de bihêlin ew dikarin desthilatdariya xwe bidomînin. Kartal destnîşan kir ku divê partiyên di nav 'Tifaqa Millî' de zanibin ku HDP bendê derbas neke ew ê jî têk biçin.
Kartal bi domdarî diyar kir ku hilbijartina 24'ê Hezîranê ji bo Kurdan û dostên wan fersendeke dîrokî ye, ji bo vê divê kêfareteke mezin bikin û got: "Em dikarin Erdogan hilweşînin. Em dikarin faşîzmê, MHP'ê hilweşînin. Şertê vê ew e ku em gel bibin ser sindoqê û serketineke mezin bi dest ve bînin. Divê em careke din 7'ê Hezîranê bijîn. Hilbijartina 24'ê Hezîranê ji ya 7'ê Hezîranê girîngtir e."



# Banga helwestê li hikûmeta Başûr kirin

***Rojnamegerên Başûrê Kurdistanê ketina leşkerên Tirk ên nava Başûrê Kurdistanê weke dagirkerî binav kirin û gotin; "Divê Hikûmeta Iraq û Herêma Kurdistanê erkê xwe pêkbînin."***

Dewleta Tirkiye êdî ketiye nava gundên Başûrê Kurdistanê. Welatî ji vê yekê di tirsin. Gelê Başûr vê yekê weke dagirkeriya xaka Başûr binav dikin. Rojnamegerên Başûrê Kurdistanê jî li hemberî vê yekê nerazîbûnên xwe anîn ziman û ji RojNews re axivîn.

**'YA KU TIRKIYE DIKE BINPÊKIRINE'**

Li ser dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûr, Sekreterê sendîkaya Rojnamgerên Kurdistan ê şaxa Silêmaniyê Karwan Enwer axivî û got; "Tu dewletek dema diçe nava xaka dewletek din, bi navê dagirkeriyê naçe, sedemê çûyîna nava xakê heye. Lê di encam de dagirkeriyê dike. Ya ku Tirkiye dike binpêkirina li hember yasaya navdewletiye û binpêkirina hember dewletên cîrane."
Enwer diyar kir ku divê Hikûmeta Herêmê li Neteweyên Yekbûyî û Encûmana Asayîşê doz veke, ku helwestek navdewletî rê li hemberî vê dagirkeriya Tirkiyê bike.

**'DİVÊ HİKÛMETA HERÊMÊ BÊDENG NEMÎNE'**

Endamê Sentera Metro Herdî Rehman jî li ser heman mijarê got; "Ketina dewleta Tirk a nava xaka Başûr, bi alîkariya aliyên Kurd çêbûye. Ev yek çi weke çete, çi jî weke xiyanetê tê binav kirin. Niha dewleta Tirk ketiye nava xaka Başûrê Kurdistanê. Erkê aliyên siyasiye ku li hemberî vê binpêkirinê bêdeng nemînin."
Herdî Rehman wiha axaftina xwe bi dawî kir; "Bêdengiya Iraqê ya li hember Tirkiye jî, karek balkêşe. Nayê zanîn bê ka gelo peywendiyek di nava wan de heye yan ne. Ger Hikûmeta Iraqê bêdengiya xwe berdewam bike, erkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî ewe ku xwe bêdeng nekin." *ROJNEWS*






## Bîlançoya binpêkirinên Gulanê li Efrînê



Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê di meha Gulanê li Efrînê zêdeyî 3 hezar û 295 sivîl revendina û 30 jin di nav de yên ducanî jî hebû, hatin revandin û tecawîz kirin.

Çete û leşkerên artêşa Tirk a dagirker binpêkirinên xwe yên li dijî sivîlên kantona Efrînê didomînin. Rojane, kuştin, revandin, êşkencekirin, dizî û talankirin, her wiha guhertina demografî pêk tên.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, di meha Gulanê de li kantona Efrînê gelek binpêkirin pêk anîn. Ji wan ajansa me karîbû zêdeyî 3 hezar û 295 sivîl hatine revandin diyar bike. Artêşa Tirk û çeteyên wê di heman demê de ji welatiyên ku dixwazin vegerin malên xwe pereyên pir dixwazin, bi vê yekê jî rê li ber vegera welatiyên Efrînê bigirin û siyaseta xwe ya guhertina demografîk ku li herêmê pêk tîne, mayînde bike.
Artêşa Tirk a dagirker li dijî jinan jî heman rêbazê DAIŞ'ê bi kar di anîn. Cilên fereh û destmal li ser jinan feriz kirine. Di meha gulanê de t30 jin di nav de yên ducanî jî hebû, revandin û tecawî kirin. Tê gotin ku hejmar ji wiha zêdetire, lê yên agahî derbarê wan hatine girtin, ev in.
Artêşa Tirk a dagirker zêdeyî hezar û 200 malbatên ji gundewarên Şam û Humis û herêmên din ên Sûrieyê li Efrînê bi cih kirin.
Çeteyên li Efrînê hatin bicihkirin, milkên welatiyên Efrînê desteser dikin û navên wan diguhre. Li bajarê Efrînê çeteyekî dukaneke telefonên destan a bi navê "Stdyo 23" ya welatiyekî Efrînê piştî ku desteser kir, veguherî xwaringehê û navê wê kir "Xûat".
Artêşa Tirk û çeteyên wê ne tenê li dijî sivîlan binpêkirinan pêk tîne, lê belê li dijî xwezayê jî destdirêjiyê dike, deran dibirin û zeviyan telef dikin. Çeteyan herî kêm derdora 50 donim zeviyên çandiniyê yên welatiyan talan kirin û zêdeyî 500 darên zeytûnan qut kirin.
Artêş Tirk a dgirker, di meha derbasbûyî de dibistana gundê Hikiçê ya girêdayî herêma Cindirêsê veguhest bargeha lepirsîn û êşkencekirina sivîlan.
Artêşa Tirk a dagirker şêniyên kantona Efrînê neçar dikirin ku nasnameya Tirkî bigirin da ku wan beşdarî hilbijartinan li pêş ên Tirkiyê bike.
Li aliyekî din jî peykerê kesayeta welatparê "Ehmed Hebo" xirab kirin.
Artêşa tTirk a dagirker li herêma Reco di navbera navçeyê û gundê HecXelîl li aliyê başûr qadeke ji bo rawestandina frokeyên hilîkopterê avakir

## Rûspiyên Ereb: Erdogan bi çeteyên xwe gelan berdide hev



Rûspiyên êlên Ereb ên Til Hemîsê êrîşa çeteyên dewlet Tirk a li dijî welatiyên ji Êla Bobena li Efrînê şermezar kirin û gotin ku Erdogan dixwaze şerekî navxweyî di navbera pêkhateyên herêmê de derxîne.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê binpêkirinên xwe yên li dijî sivîlên Efrînê didomînin. Çeteyên dewleta Tirk roja Înê li Efrînê êrîşî welatiyên ji êla Bobena ya pêkhateyê Ereb kirin. Di encam de şerê di navbera welatiyên êla Bobena û çeteyan de 5 welatiyên ji êla Bobena di nav 1 jinek û zaroka xwe jiyana xwe ji dest dan. Rûspiyên êlên Ereb yên navçeya Til Hemîsê ya kantona Qamişlo li ser mijarê nerazîbûnên xwe anîn ziman û banga yekîtiyê li hemberî dagirkeriya Tirkiyê li gelên herêmê kir.
Şêxê Eşîreya Benî Sebi Salih Dihêman dagirkeriya Tirkiyê li Efrînê bi tundî şeremzar kir û got ku deweleta Tirk gelê Kurd û Ereb tune dike. Dihêman her wiha daxuya kirin ku çeteyên girêdayî dewleta Tirk 5 sivîlên ku kiryarên çeteyan qebûl nekirin kuştin û wiha domand, "Erdogan çeteyên xwe li Efrînê kom kirine da ku şerekî navxweyî di navbera ereban bi xwe û kurd û ereban de pêk bîne."
Salih Dihêman, bang li pêkhateyê Ereb kir ku hemberî dagirkeriya Tirkiyê yekîtiya xwe xurt bikin û ev tişt jî anî ziman, "Guhertina demografî li Sûriyê rû dide bi tu awayî nayê qebûl kirin."
Rûspiyê Êla Bû Asî Mihemed Muslih El-Letîf ji aliyê xwe ve destwerdana hêzên li xaka Sûriyê şermezar kir û got ku gelê Sûriyê dikare aloziya xwe bi xwe çareser bike.
Ji rûspiyên Êla Şemer Mufdî El-Telfah jî binêkirinên dagirkeriya Tirkiyê yên li dijî sivîlên Efrînê bi "Kiryarên nemerdan" wesif kir û anî ziman ku koçberkirina gelê Kurd ê Efrînê û êrîşa li ser welatiyên Êla Bobena îsbat dike ku dagirkeriya Tirkiyê hemû pêkhateyên herêmê dike hedefa xwe.
El-Telfah di dawiya axaftinên xwe de got, "Ne ji mafê dewletekê ye ku xaka cîranê xwe binpê bike. Em wekî Êla Şemer li dijî zulmê ne û li pişta mezluman in." *ANHA*

## Encamnameya duyemîn konferansa PYS'ê



Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Suryanî encamnameya duyemîn konferansa xwe eşkere kir. Konferans di 1 û 2'yê Hizêranê de li salona El-Rewabî ya bajarê Qamişlo di bin durişmeya "berdewamkirina têkoşînê ji bo mafên gelê Suryanî û hemû pêkhateyên Sûriyê " de hate lidarxistin.
Encamnameya konferansa ku gelek nûnerên partiyan amde bûn bi vî rengî ye.
"Di aliyê giştî Sûriyeyê de hate gotin ku pêwîst e çareseriya siyasî were çespandin û pêwîstî bi beşdarkirina hemû aliyên Sûriyeyê di danûstandinên guhertina demokratîk de hate dîtin. Da ku mafên hemû pêkhateyan bêne parastin. Beşdarên konferansê diyar kirin ku ne pêkan e demokrasî pêk were bêy ku mafên gelê Suryanî yên siyasî, çandî, civakî û olî bêne naskirin. Her wiha diyar kirin ku divê şerê li dijî komên terorîst were domandin û rê li pêşiya belavbûna fikra terorîst û radîkal were girtin.
Di aliyê girêdayî gelê Suryanî, Asûrî û Kildanî de beşdarên konferansê piştrast kirin ku divê yekîtiya di navbera hemû nûnerê gel de pêk were û xebatên hevbeş bêne destpêkirin da ku armancên hêvî dar di vê qonaxa çarenûsî de pêk werin. Bi taybet ji ber koçberiyê ziyaneke demorafîk bi gelê me dike. Her wiha ji me tê xwestin ku zemîneke aramî, ewlehî û siyasî pêk bînin da ku lehiya koçberiyê were rawestandin û ji bo vegera koçberan xebat bêne meşandin.
Di aliyê rêxistinî de beşdarên konferansê guhertinên pilansaziya siyasî û rêziknameyê gotûbêj kirin û daxistin dengdayînê. Di konferansê de her wiha gelek biryarên girîng hatin standin da ku di riya têkoşîna partiyê de bibin alîkar. Di nava pilansaziya konferansê de endamên Meclîsa Partiya ku ji 21 endaman pêk tê hate hilbijartin û hevserokên partiyê jî hatin hilbijartin. Di dawiya konferansê de hemû beşdaran diyar kirin ku dê xebatên xwe bi awayekî fedekar bidin meşandin da ku armanc û mafên gelê pêkê bînin û li hemberî fedekariya şehîdan wefadar bin."

## 6 kolber girtin û kasibkarek jî birîndar



Di encama êrîşa hêzên Îranê ya ser kolber û kasibkaran a li ser sînorê navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de, 6 kolber hatin girtin û kasibkarek jî birîndar bû.Li gorî nûçeya KolberNews, êrîşên hikûmeta Îranê dijî kasibkar û kolberan berdewam dike û wiha hate gotin; "Roja Îniyê li herêma Binaw a girêdayî bajarê Pîranşara parêzgeha Urmê ya Rojhilatê Kurdistanê hêzên Îranê gule li wesayita kasibkarekî barandin. Di wesayitê de 4 kolber hebûn. Şofêrê wesayitê bigiranî birîndar bû."
Her wiha hate diyarkirin ku di heman rojê de li gundê Diawrî yê girêdayî bajarê Merîwan ê ser bi parêzgeha Sine, li herêma Hewreman komek kolber ketine kemîna hêzên pasdarên Îranê. Pasdaran gefên kuştinê li kolberan xwarin. Hêzên pasdaran jî derdora kolberan girtin û 6 ji wan girtin. Her wiha dest danîne ser barên wan jî.